# Rêbazên têkbirina tûndiyê
# Kî dikare bibe alîkar?

**Polîs** - Jimareya acîl 110
**Parastina qurbaniyan** - kesê têkildar 0331 55081090

**Navenda Şêwirmendiya Jinan** 0331 974695
frauenberatung@frauenzentrum-potsdam.de
Garnstr. 33, 14482 Potsdam

**Şêwirmendiya qurbaniyan / klînîka trawmayê ya nexweşên serpiyan ya Potsdamê**
0331 2802725
potsdam@opferhilfe-brandenburg.de
Jägerstraße 36, 14467 Şêwirmendiya Potsdamê û alîkariya dema ku tundiya navmalî û seksî çêdibe, piştgiriya pêvajoyê

**Stargeha Jinan a Potsdamê** 0331 964516
frauenhaus@frauenzentrum-potsdam.de
P.O. Box 60 01 32, 14401 Stargeha Potsdamê ya ji bo jinan û zarokên wan dema ku tundiya navmalî ya yekcar çêdibe

**Weisser Ring e.V.**
Ofîsa şaxa Potsdamê (bajar) 0151 5516 4716
pdm@mail.weisser-ring.de
Nansenstraße 12, 14471 şêwirmendiya li hember sûcan ji bo Qurbaniyan a Potsdamê

**Karmendê Firsetên Wekhev ê Paytexta Eyaletê Potsdamê** 0331 289 1084
Gleichstellung@rathaus.potsdam.de
Friedrich-Ebert-Str. 79/81, 14469 Şêwirmendiya Potsdamê û servîsa sewqê

HILFE TELEFON
GEWALT GEGEN FRAUEN
08000 116 016
www.hilfetelefon.de

FRAUENHAUS
Autonomes Frauenzentrum Potsdam e. V.

Opferhilfe
Land Brandenburg e.V.

Gleichstellungsbeauftragte
Potsdam

WEISSER RING
Wir helfen Kriminalitätsopfern.

FRAUENBERATUNG
Autonomes Frauenzentrum Potsdam e. V.

Weşandin: Paytexta Eyaletê ya Potsdam Koma Xebatê ya Parastina Qurbaniyan
Ofîsa Firsetên Wekhev û Sêwirandina Pircureyiyê- Susanne Plath
Eposte: gleichstellung@rathaus.potsdam.de

POTSDAM

# Alîkariya li dema pêkhatina tundiyê

BÊDENGÎ BIJARTIN NÎNE (ÊDÎ NA)!



## Koma Xebatê ya Parastinê

POTSDAM

Kurdisch/ Kurmanji

# Tundiya navmalî

Tundiya navmalî ew cure tundî ye ku li têkiliya zewacê, hevjiyanê, an jî malbatê - an jî navbera mirovên cudabûyî yên ku êdî li heman malê najîn çêdibe.
Tundiya navmalî di hemû komên civakê de çêdibe, bêyî ku, wek mînak, dahat, perwerdehî, an jî temenê li ber çav bigire.

Ew ên li jêr cureyên tundiya navmalî ne:

## TUNDIYA BEDENÊ

Tê de lêdana bi tiştekê an jî bêyî tiştekê, paldan, hejandin, gezkirin, xeniqandin, astengkirin, avêtina tiştan, êrîş û heta kuştin jî heye.

## TUNDIYA SEKSÎ

Tê de zordariya ji bo pêkanîna seksê û tecawiz heye.

## TUNDIYA CIVAKÎ

Tê de astengkirina li ser jiyana civakî ya wek pederşahî, qedexekirin an jî kontrola hişk a têkiliyên malbatî û derve, girtina li hundir heye.




## TUNDIYA DERÛNÎ

Tê de gefên cidî, çavtirsandin, destdanîna ser azadiyê, û acizkirina piştî cudabûnê heye. Bêhurmetî, tawanbarî, biçûkxistin, çêkirina hîsa sûcdariyê, tirsandin an jî dijûn-dayîn jî wek tundiya derûnî tê qebûlkirin.

## TUNDIYA ABORÎ

Tê de qedexekirin an rêgirtina karkirinê, desteserkirina meaş, her wisa kontrolkirina çavkaniyên aborî ya ji hêla hevjînan yekî ve jî heye.

## TUNDIYA LI SER ZAROKAN

Gelek pispor têgeha "tundiya navmalî" bi tenê ji bo têkiliya mezinan bi kar tînin.
Di rewşa tundiya hember zarok û mirovên ciwan de, cudatiyeke tundiyê ya fîzîkî, seksî û derûnî tê pênasekirin.
Her çiqas zarok an jî ciwan "bi tenê" bibin şahidê tundiya navmalî jî, bandora vê yekê li ser tenduristiya-zarokê çêdibe.

## TUNDIYA NAVMALÎ - AXAFTIN DIBE ALÎKAR!

Hûn rastî tundiya navmalî tên? Hûn derbarê kesek li taxa we an jî nêzikî we xwedî endîşe ne? Hingê ji kerema xwe bibin alîkar û bêdengiyê xirab bikin!

Servîsên ku navendên şêwirmendiyê yên Potsdam pêşkêş dikin hemû kesên ku rastî tundiyê tên armanc dike, bêyî ku li temenê wan, asta perwerdehiyê, meyla wan a cinsî, statuya civakî an jî paşxaneya çandî binêre, heta bêyî ku lê binêre ka kengê û çawa rastî tûndiyê hatine.

**Armanca Koma Xebatê ya Parastina Qurbaniyan ew e ku piştgiriya ji bo qurbaniyên sûcan bi pêş de bibe.**